

Selîm Berekat:

“Ez kurdim, dirawsiyê min kurde,
gundê min kurde”



Ferhad Hacî

Berahîk

Selîm Berekat yeke ji mezintirîn hozan û romannivîsên kurdan û ereban (yên bi zimanê erebî nivîsandin), kes nikare bibêje ku evî zalamê kurd zêdekirin û guhurîn di roman û hozana erebî de nekiriye. Lê xala cihê mixabaniya mirovayetiye ewe ku piştî wê xizmeta mezin bo rewşenbîriya ereban kirî û piştî bûye stêreka geş li asmanê pitir ji 20 dewletên ereban, dijminatîya wî dihê kirin ji aliyê hindê demargîran ve. Piştî ku kurdîniya xwe li ser gupîtka çiyayekî ragehandî, her çawabe ev zalamê kurd dê bimîne elementek serekî di rewşenbîriya kurdî, erebî û mirovayetiye de û her ji vê xalê hukmeta swîdî Selîmê Berekatî li ser axa xwe mêvan kir û hindê erebên Urdinê romana wî “Dilşad Ferasix elxlud elmehcure” di sala 2003-ê sotin.

Jiyanname:

Gîyan = mîdî ye

Henase = karduxî ye

Leş = mîtanî ye

Hizir = subarî ye

Rêveçun = gotî ye

Zimanê derbirînê = erebî ye

Pêkhat = kurd e

Ji gundê Musîsana dagîrkirî û veder ji cîhanê, Amuda dagîrkirî, Qamişloya birîndar Dîmeşq wargehê sîxuran, Beyrut dirawsêy bê şans, nîqusiya nîv xweş (16 salên manê), Stockholm (li gel hevjin û 3 zarokên xwe)....., cihên jiyana wî ewa bû çiyayekê xema li ser dilê wî, hêşt zarok dil û hizra wî bi ava dahênanê û nexweşiya hate şuştin, evî zalamî çî saxlet nînin ji bilî saxletên serekî yên kurdan:

Çavên tirsyayî...

Biryên westayî....


Dêkorê demê wî ne

Evî zalamî çî dirûv nînin ji bilî dirûvên serekîyên kurdan:

Nexweşî... Bindeştî....
Stemlêkirin... Xemdarî.... Û htd
ji ferhenga jiyana tehl ewa ji
bêdewletiya kurdan peyda
bûyî.

Yê mezin bû di nav gêjevanka
dariştineka xwînelû de... Ew
dariştina direwîn û xapînok,
Evro bi xwîne dikirî û dîtira
rojê bê beramber û herwe
difiroto.

Yê mezin bû di nav
şepirzeyiyeka givaştî de ewa
jiyê kurdan gorî xwekirî....
Direw û xap belav kirîne li ser
rêkên mêşkî û peyvan, çil sala
evî zelamê kurd gotareka sê
seriya herfandkar da dora,
hestî dibijikand... Giyan
devrok dikir û dîrok û



cografîya jê re bibû zîndana qeyranan, tirs û nexweşî bi yeksanî li ser
hest û nestên wî hatîne barvekirin ji derveyî dap û nerîtên mirovan, çî
bo nemaye ji bilî hembêzkirina ezmanên bîjnên genc li hêviya zelamê
xwe li êvariyeke dereng dergêhî biqute û çavên wan bikevin êk û
stirana Eyaz Yusfî bibêjin "çavên me ketine êk... Gelek axiftin li gel
êk"

Çî bo nemaye ji bilî samankirina zêmar û qêriya çend zarokên
surînlak û pepîk ku babê wan yê hatî revandin li ber derazînk
hêviya li eywankî... Ew babê digut dîwara (kêşa kurdan.... Nefilmekê
siraylî ye), çî bo nemaye ji bilî barandina axînk liser bi hizarehan
gundên kavlkirî, çî bo nemaye ji bilî berihingariya siyasteka
nivşperst ku welatê wî kirî ye zeviyeka taybeta sultanê dîne îslamê bi
hurî û hewaryên xweyên têda dizên û ve dizên û sêva dixwin.

Çil sal in û giyanê kur û kiçên Selîmî û îcaxa wî wekî genimî dihê
dirwîn.

Çil sal in û xwîna wî ji ber diçe, belê ew xwîn xabîr tê de... Dahênane û
zelam berhemê wê ji ber çûna xwîne ye.

Sê mirovan mala nivşê Selîmî wêran kir:

Yê yekê ceneralekî mîr Mihêkuje

Yê diwê aytellahekê Qasimlokuje

Yê sêyê zelamekê heştêyê tiştên mirî û efsanên nivîskî bi (îdeolojiyayeka genî, pêtola bû benî... Ji bo bankên nepenî) dijene.

Dewleta wî ya biçîkiriye di çend bajêrekan de û bajêr biçîkirîne di çend gundan de û gund kurt kirîne di çend xêzanekan de û xêzan kutek tûlekên dagêrkeranin.

Heta evro davên dostatiya dijmin, hevala li ber çavên gelê wî cîhaneka mijewiye, ew dijminên hemû (tiştên nemir) tapukirîn li ser xîzê biyabanê û çermê gurgekî li faristanê.

Kes neşê dilniyabûnê ji bo dayika wî çê bike ku ne bo selmane, yan jî ji xwîna cuhiyane,

Çunku du kurên wê eve serê (26) salane ên bûyin pariyekê nanî û erdî yê dauwray, eve jî qedera kurdaye ku xwe gurî bosteka axê biken û miyekê xwe şaş nekin.

Berhemên wî:

Pitir ji (30) sala ev zelamê kurd yê bo mêvanê cîhana nivîsînê evca çî bi gotara yan bi hozana yan bi romana, hijmara berhemên wî dibine (28) pertûk ji wana (15) roman heger (alcndib alhdîdî) û (hate aliyen, hat elnefir ela axirîhî) me hijmartin roman ji ber ku (jiyaname) ne û (12) komên hozana hene û zêdebarî pertuka (eleqirebazîn _ gotar di zanistê lêkolînê de) nivîsînên wî zimanê erebî û rewşenbîriya kurdî zengîn kir, derbarey romana, heta niha jî 15 berhemên wî hene.:

Sebaret romanên wî bê dudilî pitiriya nivîser û rexnegirên ereb û kurd dibêjin (ji bilî mirovekê kure û zikreş ku serbora vî zelamê kurd nabîne û sivik temaşe dike) ev zelamê kurd mezintirîn û jîrtirîn romannivîsê kurdane û (yên bi zimanê erebî nivîsayin û dinivîsin piştî Necîb Mehfuze û kitumatekên dîtir) romanên wî bi zehmetirîn deqin ji bo têgehiştinê peyv û ramanên wî wekî zivirokê mirovî gêj dike. Zimanê ew bi kar dihîne gelek bilinde û tijî mij, şeh, ewrîn û tirumpêlên barkirî ji TNT ciwaniyê di nav cadên hizirên wî de dihên û diçin, binistira dahênanê link wî her û her ew zimane yê ji aşupa û ya kedxweda dizê û vedizê û sêvên behîştê dixwe ew ziman ne destkird ango ne çêkiriye û armanc ne sergêj kirina xwendevaniye, anku armanc ne ajaweye û cûkanê ye, ew ajawa nivîser Îbrahîm Mehmud jê re dibêje: "*ajawe qurtalbûn... Bi ajawa xwe Selîm Berekat şerî li dijî sîstemek arastekirî, tirsnaq dike û dixwazit wê di turey da (di romanê da) terabera biket.*"

Romanên wî ji bo têgehiştinê bi zehmetin, anku bo êkemîn car peyvên wî nahêne dawran û têgehiştin belê li gel xwandina diwê û siyê kunc û cihên ciwaniya peyvên wî diyar û kifş dibin, bi manayeka dîtir pitiriya xwendevanên nivîsînên Selîmê Berekatî di van qunaxan

de derbaz dibin:

1 - Xwandina yekê: Zimanekê seyir û bi zehmete.

2 - Xwandina diwê: Neçariya têgehiştinê ye.

3 - Xwandina siyê: Guncandin li gel zimanî.

Û nahê veşartin ku ev zelame yê bû xwedan pirojeyekê serkeftî yê nivîsînê, yê bû xwedan serboreka ji hejî ku bibe dibistan bi hemû hûrûhûrikên serbora xwe ve, me bivê û nevê evî zelamê kurd dunyayek dahênanê di romana erebî de kiriye, belge jî ewe romanên wî hatîne wergêran ji bo zimanên ingilîzî, elmanî, firensî û swîdî jî.

Nivîserê kurd Konê Reş di hevdîtinekê de dibêje: "Di hevdîtinekê de li gel romannivîsê Suryê mezin "Henna Mîna" bo rojnama (deng û basên wêjeya Misrî), ev romannivîsê navbirî sohbeteka dirêj kir li dor (serbor davakirina romanê) de û nûkirin û werarbûna wê ber bi baştir, evî navbirî serkeftina romana ereba bo karên xwe û romannivîsê cîhanî Necîb Mehfuze vegerand bê ku nîşaneka biçûk bi navê romannivîsê Surî yê nejad kurd Selîm Berekat bide (ewê bi erebî dinivîse) Selîm Berekat û nivîsînên wî bûne ferhengeka giranbiha, ciwan û ronahiyek zêde kir li ser zimanê erebî bi wê jîngeha kurdî û aşupa kurdî.

Herwesa gelek palpştyê li ser danustandinê naket, belku bi zimanekê huzankî û aşupî dîmenan destnîşan dîke û vegêrana wî ketiwarî dîke bi şewek ciwan her weku tu dibêjî wênegire.

Ji ber ku ziman di romanê de senterê dahênanê ye û aşupe dihê tewzîf kirin lewa Selîmê Berekatî dahênanê dîke ji ber ku ji mêje were yê di riha ra girtî hozanvanê, Surî edîb Hesên Mihemed

(taybetmende bi nivîsînên Selîmî) dibêje: "Di romanên xwe de Selîm Berekat serederiyê li gel jîngehê bi awayekê sîhirî dîke û mifa mîtolojiya ya mifa zengîna Cizîrê û dîroka dêrîna gelên li dûv êk li wê derê jiyayin wergirtiye".

Yê romanên Selîm Berekatî bixwîne dê hêbetî be ji vekolîn û dûvçûna wî li dor kesatîyên perawêzkirî (jibîrkirî) û pîtepêdana wî bi hindêk hûrhûrikên jibîrkirî li



deverê.

Xanim Marîna Stag (Mamostaya toreyê ereba yê nû li zankoyên Stockholm û Upsala) karê wergêranê dike ji zimanê erebî bo zimanê swîdî du karên Selîm Berekatî wergêrane bo zimanê swîdî (jiyanname) û (elirîş).

Subhî Hedîdî rexnegirê suriyê li Parîs dijî derbarey romaneka Selîm Berekatî (ku tê de mirovek ji dayik dibet piştî 7 demjêman dibe 30 salî û êvarê dibe 40 salî û bi şev dibe 50 salî, li demê ji dayik bûy li gel dayik û babê xwe diaxive dibêje: "Zalbûna efsana Bêkesî û gehîştina wê ya bi lez bo cografiya û dîroka vê giropa mirovayetêy, efsanê di nav pêkenîne de, belgenamê di nav hêbetiyê de, ketwarî di nav fantaziyayê de, dîtina millî di nav xewnên sofîgerî de, nêrîtên jiyane di nav kabîsan de diheline.

Di romana (elirîş) de pêşewa Qazî Mihemed serokê komara Kurdistanê li Mahabadê gotarekê dixwîne derbarey wê gotarê Selîm Berekat dibêje: "gotara Qazî Mihemedî bi rewanbêjîyeka kurdîxwandî di nav cemawerekê de ku zimanên rûsî û turkiya Azerbêcanî dizanîn û berhevbûna lijna navendiya partiya dîmokrata Kurdistanê, bi dilê Moskow bû, lewa zelumî dakokî li ser birayetiya kurd û Azeriyan kir li wê deverê, li wê derê hevrikî veşartî bû, berjengên diyarbûna wan hevrikiyan serê xwe heldan, di bin hebûna Sovyetî ve li wê derê, bi rastî û di ketwarî de komara Azerbêcanê ya otonomî hevrikî li gel komara Mahabadê dikir ji pêxemet erdî, gund û rêk û rêbarên herdu wan di nav êk de bûn, astê hizirî binistira cudabûnê bû di nav herdu komaran de, di demekî de ku komînîstperwera desthelat li Azerbêcana îranê wergirtin bi piştevaniya koçberên ji Azerbêcana Sovyetê hîxwazên sosyalîstî, kurdên komara (Mahabad) hozên dîndarbûn û Azerbêcaniyên sor (bermayên partiya tudey ewa bo parta Azerbêcana dîmokratî) ne bi dilê wan bûn, sîxur û polîsên nepenî li hemû cihan belav bûn, da ku beramberî paşkeftinxwaza birawestî heger bûne asteng di rêka cemawerî de û dî serhildêra ku Qazî Mihemedî piştrastbûn diyar dikir ku (karûbar dirustî) belê hevrikî di navbera herdu gelanda aşîkirabû.

Jalîyekê dîve ev zelumê kurd dête hijmartin weku baştirîn hozanivanên bizimanê erebî dinivîsin û huzanên wî li serê gupîtka çiyayê hozana ereban cihek baş vegirtî ye, serederiyeka kûvî digel zimanê erebî dike û her ji roja destday nivîsîna huzanê bi zimanê erebî li nik wî kaniyeka zelal bû beramber têhina ûya tijî kul û xem û nexweşî her ji sala 1973 gava êkemîn koma hozanên wî bi navê " كل

داخل سیهتف باسمی وکل خارج paşî li dûmahîka salên heştîyan (pênç) komên hozanên wî li jêr navê dîwan çap bûn, berhemên Selîm Berekatî di warê hozanê de evene:

Her berhemek ji van berhemên li serî diyarkirî dunyayek dahênanêye di dîroka hozana erebî de, zimanê mijewî (ku tu caran dê hest bikî Selîmê Berekatî naxwaze tu berhemên wî bixwînî bi taybet heger wergir mirovek bihênteng be) asê û têr asêgeh, ne deq û têtîstek bi sanahî ye ji bo wergirtinê belku ew jî wek romanên wî pêdivî bi 3 carên xwandinê ye, da ku (xwedanê zimanî) di zimanê xwe bigehê û min bi xwe xweşiyek mezin ji xwandina hindê helbestên wî yên berdest dît, jîngeh, Kurdistan, gund û hestên wî bi giyanekê xurt ve di helbestên wî de melevaniya diken û di ramanên peyvanda wêneyên ciwan digehin dil û derunê mirovî, ferhenga wî caran dagirtiye ji peyvên tijî ciwankarî, mîna me diyarkirî wendabûn di nav ramanên peyvanda caran burikane û caran seybîriyaye û di her wan haletan de bi kutek têgehiştin

Dibe behra wergirî, derbarey hozanên wî rexnegirekê Surî dibêje:

Belgeyên giringin li dor peydabûna Cizîrê (li Kurdistana Suriya) û derbazbûna wê ji qonaxa gundiyatîyê bo bajêrvaniyê.

Û bi hizra min li demê li destpêkê Selîmê Berekatî hozan ve handî xwest binê oqiyanusê zimanê erebî vekole û vedîtina tê de bike, da ku helbestên xwe bi zimanekê asê binivîse, hozanvanê kurd Şêrko Bêkes dibêje:

- ew nivîsê piştî Selîm Berekatî hemû li ser rêka heman dibistana wî ne herweku tu bêjî ji bin qapîtê wî derçwîne. Weku dête zanîn hozanivanên mezin û dahêner hindêk taybetmendî hene. Hozanivanê beriniyas edunîs dibêje: Kilîlka zimanê erebî ya di destê vî kurdîda. Nivîserekê dîtir dibêje: "Selîm Berekatî şiya di êk pertûka xwe de jimareka mezina giyaneweran kom, kit pitir ji giyanewerên pêxemberê xwedê (nuh) î di papora xwe de kom kirin.

Li dor vê axiftinê Selîm dibêje:

Hovâtî: Antî yasa, astê epîstimolojî: Anku hozan, giyanewer hozane.

Kurdîniya wî:

Êk ji arîşên çandî yên neteweyên bindest û bê dewlet ew e hijmareka dahênerên wan bi zimanê biyaniyan (dagêrkerên xwe) nivîsayne û dinivîsin li gorey çend egerekên dîrukî û siyasî û rewşenbîrî, ev kêşe li hijmareka cihan serhildaye bi dirêjahiya van sedsalên Burîda di nav ereba û kurda... û htd, ne bi tinê dahênerên gelên bindest tuşî vê arîşê bûne belku gelên wan jî di jiyana xwe ya rojane de zimanê dagêrkerên xwe bi kar dihînin, caran dahêneran koç kirine ber bi

zimanê wan dahênan kirîne, ji berê em behsê kurdîniya (kurdayetiya) Selîm Berekatî biken girînge ev her dû bûçûn di hizra me de be:

1 -Rexnegir û nivîser hene digel wê yekê ne ku ew berihemên bizimanê biyaniya dête nivîsîn nabite samanê xwedanên zimanî (ne) belku dibe samanê gelê nivîserî, ji ber ku nivîsîn di naveroka xwe de kiryareka mirovayeti ye û di gel de jî ew berhem rewşenbîrî û pertûkxana gelê nivîserî kedxweda dike, û dibe cihê şanaziya kur û kiçên gelê nivîserî, anku wan dahêneran xizmeta neteweyê xwe kirîne bi zimanê biyaniyan.

2- Rexnegir û nivîser hene li gel wê yekê ne ku berhem bi çi zimanî bihê nivîsîn dibe samanê xwedanên wî zimanî, ji ber ku ziman û ferhenga wan kedxuda dike û di nav pertukxane û ferhenga wan de dihê rêzkirin, bi hêceta hindê ku derbirînê ji ketwar, jîngeh, mirov û dabûnerîtên gelê nivîserî nakin. Belku berûvajî, anku xizmeta netewê xwe kirîne. Evca heger bi vî destûdarî be Selîm Berekat zelamekê kurd e çunku:

1 - Ew hemû stem û çewisandina kurdan dîtî Selîmî bi hemû tehlatî ve tam kiriye wê nexweşiyê, eve pitir e ji 26 salan û dû birayên wî berze bûne gava polîsên dewletê destên wan girêdayî û heta evro jî nediyarin.

2 - Ji bilî derbederbûna wî, malbata wan jî li kolanên dunyayê belav bûne (Suriya-Libnan-Misir-Elmaniya-Swîd).

3 - Jîngeha Kurdistanê û navên kurdî di nav berhemên wî de gazî mirovî dikin:

- Kurdistan, Mahabad, Bêkes, Şemdîn, Mem, azaw, dîno, hîvîn, lat, Eyaşan (kurdîkirina aşe), Rohat... û htd. Nivîserê surî Subhî Elhedîdî di nivîsîneka xwe de wesa diyar dike ku hindek kesatîyên romanên Selîm Berekatî dirêje pêdana hindek kesatîyên di ketwarî da heyin mîna: Mela Selîmê Bedlîsî: Xwedanê şoreşa xedir lêkirî. Şêx Mihemedê seyde neqîşebendî: Serkirdê serhildana kurdan ya êkê. Hisîn Mukriyanî: Xwedanê êkemîn çapxana kurdî.

Ehmedê Xanî: Hozanvanê kurdiyê klasîk û danerê tirajîdiya Mem û Zîn.

Qazî Mihemed: Serokê komara êkê ya kurdan.

Îsmayil (Simko) axa. Her di wê nivîsînê de nivîserê navbirî wesa diyar dike:

Ku vejandina jiyana jîbermayekê mezin ji mirov û rûdanên taybetiyên girêdayî bi bîroka millî ya devera Cizîrê ya Surî bi şewek giştî û bîroka welatîyên wê yên kurd bi şewek taybet.

4 - Bila ji bîr nekin ku Selîmê Berekatî û gelek nivîserên kurdan bi çivê

xortiyê û li gorey siyaseteka şovînî bi dirêjahiya salên dagîrkirina Kurdistanê neşyan berhemên xwe bi zimanê xwe binivîsin, anku neşyan bi zimanê xwe yê neteweyî derbirînê ji hest û sozên xwe bikin.

5 - Romana wî "Dilşad" di sala 2003 bi destên erebên urdinê hate sotin ji ber ku urdiniyan gotin: "Ev roman jêderê gefane li ser asayîşa ereban û Urdinê jî", derheqa vê romanê de Selîmê Berekatî dibêje: "100 % ev roman kurdî ye".

6 - Di roman û hozanên wî de kêşa kurdî tê de diyare wekî di romaneka wî de "gencekê kurd dihê raspardin bi karekî ve ku girêdayî kêşa kurdiye", her wesa navê komeka hozanên (hikja abpir musîsana) navê gundê xwe ye li Kurdistanê Suriya, ew bi xwe jî derbarey paşeroja kurdan di romaneka xwe da dibêje:

Tiştên bê mana eve jî nîşana nearamiya wê paşerojê ye.

7 - Weku dihê zanîn ku Selîmê kurd xizmet û dostatiyeka mezin li gel Felistîniya hebû û hevalînî li gel serokê berê yê Felistînê Yasir Erefatî hebû, belê wekî nivîserê kurd kunê reş diyarde ku (diser hindêra Selîm Berekatî xizmeteka bê sinor bo ziman û rewşenbîrî û rêkixirawa rizgarkirina Felistînê kir û hevkarîya wî li gel hozanvanê navdar Mihmud Derwêş di weşandina kovara (elkermil) belê di ser hindê re gava Selîm Berekatî kirî qêrî di nav kovar û rojnaman de "ez kurdim..... Dirawisên min kurdin..... Gundê min kurd e" êkser bû jêderê ajawê di nav ereban de.

Konê Reş dibêje: "Mirov rastiyê biaxive kurdîniya Selîm Berekatî di nav derun û nivîsinên wî de çî caran û êk xulkê jî dût nebûye, kurdîniya wî diyar e di nav qaremanên wî yê kaxezî de.... Pitir kurdîniya wî diyar bû gava rewşenbîrên kurd (piştî herfîna Yeketiya Sovêtiya berê di sala 1991) hevbendî bi wî kirin û agirê kurdîniyê di nav leşê wî de xurt kirin, agir berdan peyvên veşartî di nav şanên eqlê wî de, ew hevbendiya nerêkxistîya rewşenbîrên kurd Selîm Berekat paldan ku pitir û pitir xwe bi netewe û kurdîniya xwe ve girêde û xwe di nav rêkên Amuda, Qamşlo, Musîsana û Til Erbîd de bibîne Selîm Berekatî bi qelemê xwe nexşe li ser sîngê hemû kurdan û hemû xwendevana dirust kir bi rêka helbesta "Mahabadê"

Konê Reş pêve diçe û dibêje: "hevbendiya Selîm Berekatî li gel nivîser û rewşenbîrên kurdan li dervey welatî rûdaneka toreyî ya giring e (behse wî demî dike) û xizmeteka mezin bûye ji bo toreyê kurdî û rewşenbîrên kurd.

Dîsan helwîst û hebûna wî di nav kur û keçên kurdan de handerek bûye ji bo wan nivîserên kurdan ewên bi zimanê biyaniya dinivîsin û

ageh ji xem, kul û nexweşiyên kurdan nînin û di guhê gayê de nivîstîne, Selîm Berekat weku hêma, nimûne û mamosta bo hijmareka mezin ji nivîserên kurdan dê kartêkirineka mezin bike ji bo vegeeriyana nivîserên dûrî kurdîniyê bo hembêza netewê xwe bê ku li xwe bizivirin anku tirsî ji destdana xweşî û berhemê dahênana wan bi zimanê biyaniyan.

8 Di nivîsîneka xwe de ev zelumê kurd wesa diyardke ku: Deshelatdarê welatê wî (Suriya) li gel Turkiya ewa peymanameyên girêdayî bi asayîşê ve li gel siraylê heyin rêkeftîne ku (pirsa kurdî ya planxwaz) kambaxtir û tirsnahtir ji axa wan ya dagîrkirî dihejmêrin.

9 - Di hevdiîneke de bo rojnama (Alizman) hozanvanê mezin (Şêrko Bêkes) dibêje:

- kurdîniya helbestê yan erebbûn ya espanîbûna helbestê çalakiya xweya binekukî ji zimanê xweyê resen di wergirt, jipeyvên xwe, ji wêneyên xwe, ji nimûnên xwe, ji wêneyên hizirî, ji ritma hevoka, ji sîbera mana, ji kulturê barkirî, ji pêkhata wê ya zimanvanî, ji dariştin û taybetmendiya dîtina..... Û htd.

Şêrko Bêkes dizane ku:

- Hozanvan û nivîserên mezin û dahêner hene (di nav kurdan de) li ser wan hatiye qedexekirin ku bi zimanê xwe yê (neteweyî) binivîsin û li ser wan hatiye sepanandin ku bi zimanekê biyanî binivîsin, ew bi xwe jî hest bi jiyatiya xwe (neteweyê) dikin, evca çî di jiyana rojane de yan dinivîsînên û dahênanên xwe yê berdeham de û ev çend e jî ji derveyî viyan û helbijartina wan bûye.

Li dor vê diyardê Şêrko Bêkes dibêje: "li gorey çend egerekên siyasî, dîrokî û rewşenbîrî (ew nivîser) naçar bûne bi zimanekê dîtir binivîsin û dahênanê di wî zimanî de kirîne yan jî bîroka wan ya kurdî berheviyeka berdeham di berhemên wan de heye, belê ne bi zimanê xwe nivîsan û helbest ji berî her tiştêkî zimane".

Bêkes dirêjîyê bi axiftina xwe dide û dibêje: "Ehmed Şuqî kurd bû belê bi zimanê erebî dinivîsa û çî wêneyên hestê kurdîniyê rastexwe û nerastexwe dinivîsîn û helbestên xwe de diyar nekirîne, xwe pîteka wî jî bîra me nayne ku kurd e. Mehmud Teymur û Eqad û hindekên dîtir ku em hest bi tiştêkî li dor kurdîniya wan di nav berhemên wan de nakin û em naxwînin. Derbarey nivîserên kurd ewên bi zimanê biyana dinivîsin ku kurdîni jî guhên berhemên wan dirêje". Şêrko Bêkes dibêje: "Hindek nivîser û hozanvan (ên kurd) hene evca çî li Iraqê, Suriya, Turkiya, li Îranê bi zimanên erebî, turkî û farisî nivîsîne û dahênan kirîne, belê di nav berhemên wan de em hest dikin û dixwînin tirs û pirsên temam yê jiyatiya wan, çî bi rêka wêneyên

jiyana rojane, yan kulturê kurdî, yan efsane, yan navên kurdî.... htd, ew bi hestekê kurdî dinivîsin belê bi zimanekê ne kurdî".

Û derbarey Selîm Berekatî û Mihê Eldîn Zengene û Ebdilmecîd Letîf û Îbrahîm Yusif.....Û htd. Şêrko dibêje: "Evên (jê gotî) cudane ji ewên dîtir yên ku bi zimanê erebî nivîsayin û vala ji hestên kurdîniyê. Diviya ez hewsengandina wan berheman bi zimanê erebî bikim û helbestên bi zimanê erebî hatî nivîsandin. Bê ku ez mandel bikim ku helbesta taybetmendiya hestê kurdîniyê heye, jêyatiya wan bo birîn û zêmara kurdan, anku ez deqekê bi zimanê erebî hatî nivîsandin dixwînim, belê ew deq heman xwîn ji ber diçe, ew xwîna ji ber helbestên min diçe".

Bo zanîn Şêrko Bêkes dibêje, di namekê de Selîm Berekatî gote min: "Leşê min kurdî ye û zimanê min erebî ye".

Di cihekê dîtir de dibêje: "Hozanvanê surî yê kurd mirove bi hemû ramana peyvê belê hozanên wî ne kurdîne çî weku ziman yan dariştin yan ritim. Û her mebesta Şêrko çî be em neşên çipkeka gumanê di nav derya kurdîniya Selîm Berekatî da peyda bikin, çunku heta evro jî li xwe neziviriye".

Jêder

1 - ji entirînêtê / aitjar Selîm Berekat kiserû alî şîb libnan, milhiq cirîde alnhar alpqaftî, aldid (?), altarix (?).

2 - ji entirînêtê /hevûdîtî di gel nivîserê kurd Konê Reş, pêşekî û danûstandin, Bêwar Îbrahîm, ji Amude. Com/ewraq-ewraq kurdî ye /jimare (10), roj 3/5/2003

3 - ji entirînêtê/cirîde Alizman, aldid (1279), altarix (6/8/2002), dîdar li gel Şêrko Bêkes.

4 - ji entirînêtê /sibhî alhdîdî, silîm Berekat û Alimşîru Alirway Alimdîd: Amtzac alupîqe balcîb walwaq balfantaziya, waltarix balhlim, ji

Ûw. Amude. Com/ewraq-ewraq kurdî ye aldid (7), altarix (1/2/2003).

5 - ji entirînêtê/abirahîm Mihmud, Alnqle baitbariha timirda fî aladib: Selîm Berekat fî riwayte alcdîde (mutî

Mibtîdun), jîhttip://ûw. Rezgar. Com/m. Asp? I=717

6 - govara Nûbûn, jimare (52), gulan2004, romana (dîlşad) bi destên ereban dihête sotin!, yasirê Hesenî.

7 - ji entirînêtê /tarawge rêga le afirandin nagirî, wergêranî: Kawe Emîn, ji û St piresis. Se/zino

8 - ji entirînêtê /adîb hisin mihmid, wiqai birinamic xas n silîm Berekat fî alajae alsurî ye, ji

Hittip://ûw. Rezgar. Com/m. Asp? I=876

9 - ji entirînêtê/cirîde alşiriq alusig aldid (9455), altarix (17/aktubir/2004), liqami Alimstirbe alswîdî ye: Marîna stag.

10 - ji entirînêtê /cirîde (alnhar) Alirbî û aldulî, abirîl 1979, hiwar mi silîm Berekat.